Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1248 | 16-Sibat-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 'Dicle FM yek ji berhemê Şoreşa Rojava ye'

**Tekoşîn Amara/ Qamişlo**

**Reveberiya Dicle FM Felek Mihemed diyarkir ku Dîcle FM yek ji berhemên şoreşa Rojavayê kurdistanê ye ku kar û xebatên xwe dimeşîne, li gel hemû astengiyên Dewleta Tirk a dagirker jî Dicle FM dengê xwe dide bihîstin û dibe deng û rengê civakê.**



Rêveberiya Dicle FM Felek Mihemed ji rojnameya me ra behsa girîngiya çapameniya azad, kar û xebatê Dicle FM kir.

**'Çapemeniya azad roleke girîng dileyîze'**

Felek Mihemed diyarkir ku Çapemeniya azad li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û çarparçên kurdistanê xebatên girîng dimeşîne û got " Çapemeniya azad ji bo ku bibe alîgirê rastiyê roleke girîg dileyîze û dibe dengê êş û kêyfxweşiya civakê. Rûxmê hemû metirsiyan jî di hemû qadan de xebatên xwe didomîne. Dicle FM jî di bin siya çapemeniya azad de kar û xebatê dimeşîne da ku deng û rengê gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ji giştî cîhanê re ragihîne.

**'Li ser dengê rastiyê Dicle FM xebatê dimeşîne'**

Felek Mihemed ragihand ku Dicle FM di 18'ê Gulana 2021'an de weke qanaleke girîng a radyoyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dest bi weşanê kir û wiha got" Rojhilata navîn heremeke tijî pevçûn û alozî ye, ji ber wê jî em wek çapemeniya azad bêalîbûnê bingeh digirin û bi rêya belavkirina çanda hemû pêkhateyên herêmê, hewl didin jiyaneke hevbeş ava bikin ji bo gihandina dengê rastiyê Dicle FM li ser asta herema Dêrikê û derdora wê 18 saetan xebatên xwe dimeşîne ji 7.00'ê sibê destpêdike heta 12.00 şev li ser du pêlan kar dike pêla navendî 100.3 li Bajarê Dêrikê de xebat dike pêla 8.7'jî ji Dêrikê heta qamişlo, ji aliyê Başur de jî heta şengalê dibe dengê rastiyê . Di radyoya Dicle FM de beşa Kontrolê bingeha radyoyê ye ku Radyo li ser hatiye avakirin , di navenda Nûçeyan û beşa Nûçegihaniyê de jî 3 beş hene. Beşa kontrolê, beşa Nûçegihaniyê heye. Navenda nûçeyan bi zimanê kurdî û erebî kar û xebat tê meşandin.

**'Rojevên weşana Dijle FM'**

Felek Mihemed got ku" Rojevên ku di weşana me da xwe didin pêş hemla cîhanî ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ku ew 26 salin di gireva îmraliyê de di bin îşkenceyeke giran de tê ragirtin. Meş, çalakî û hevdîtinên ku pêre tên kirin. Herwiha êrîşên Dewleta Tirk li ser parastina medyayê, êrîşên li ser sivîlan û binesaziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Êrîşên li ser Rojnamevan, zarok û jinan jî di weşana me da dibin rojevên sereke. Mijarên girêday pêvajoya ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê têde derbas dibe û rola jin di şoreşa 19'ê Tîrmehê de, îşkence û destdirêjiya ku li ser jinê tê meşandin. Darizandina jinê li Rojhilatê Kurdistanê û îranê mijarên serekene."

**'Dicle FM yek ji berhemên şoreşa Rojava ye'**

Felek got ku Dijle FM yek ji berhemên şoreşa Rojava ye ku dibe deng û rengê civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê û wiha dirêjahî da axaftina xwe "Di radyoyê de gelek bernameyên taybet jî têne pêşkêşkirin bernameyên siyasî. Civakî, jin, ol û tenduristî û çandî cîh digrin. Li gor geşedanên li Rojava, rojev têne guhertin piştî ruxandina Rejîma baas êrîşên dewleta tirk li ser herema Bakûr û Rojhilatê Sûriyê zêde bûn li ser bendava Tişrînê, Minbic û Eyn Îsa û gelek heremên din bi rêya çete û balafirên xwe êrîşan li ser heremê pêk tîne. Şervanê QSD'ê berxedaniya bêhempa li hemberê wan dimeşîne di heman demê de gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bê tirs berê xwe didin Bendava berxwedanê rûxmê ku dewleta tirk gelek caran gel dike armac jî, gel berxwedaniyeke dîrokî dimeşîne. Gelê Bakûr û Rojhilatê sûriyê di dîrokek pir hestiyar re derbas dibe şerê hebûn û nebûnê dide meşandin, berxwedaniya gel ne tene li Rojava, li çar parçê kurdistanê û derveyî welat jî tê meşandin. Di radyoyê de van mijaran bi rêya dosya, nûçe û bernameyan di rojeva me de cîh digrin.

**'Dewleta Tirk rojnamevanên ku rastiyê dişopînîn dike armanc'**

Felek di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser êrîşên Dewleta tirk yên li ser Rojnamevanan û wiha domand" Li Çar parçên Kurdistanê û taybet li Rojavayê kurdistanê Rojnamevan gelek caran dibin armanca êrîşên Dewleta Tirk a dagirker di êrîşên herî dawiyê de jî 9 hevalên me yên rojnamevan dema ku êrîşên dewleta tirk yên li ser heremê dişopandin bi awayekê hovane hatin hedefgirtin, di nav rojnamevanan de 2 endamên Dicle FM jî bi giranî birîndarbûn. Bila dewleta tirk vê yekê baş bizanibe em ê, tu carî dev ji rastiyê bernedin û heta dawiyê em ê bibin dengê heqîqetê."

# 'Muzîkê dikarîbû eşqekê di hundirê min de ava bike'

**Berçem Silêman/Qamişlo**

**Muzîkjen Îvan Ibrahîm diyar kir ku dema mirov ji tiştekî hez bike wê gelek gavên serkeftî bavêje û afrîneriyê jî bike û got, "Roj bi roj muzîkê karî eşqekî di hundirê min de ava bike."**



Îvan Ibrahîn 31'ê Gulana 2002'an de li bajarê Qamişlo ji dayîk bûye. Wî heya refa 11'an xwendiye û paşê berê xwe daye mozîkê. Ji sala 2015'an ve wî dest bi stranbêjiyê û lêdana tembûrê kiriye.

Di derbarî jiyan û fêrbûna mozîkê de, mozîkjen Îvan Ibrahîm ji Rojnameya me re axivî.

**'Bi riya mozîkê mirov peyaman dighîne'**

Îvan Ibrahîm da zanîn ku Xalên wî li amûrên mûzîkê dixin û bavê wî jî li tenbûrê dide û wiha got: "Hertim li mal dema bavê min li tembûrê dida û distirandin, min lê temaşe dikir û ez roj bi roj pêve dihatim girêdan. Lê dema min xalên wê yê zirav nas kir û çawaniya bikaranîna wê êdî min biryar da ku bavê min, min fêr bike. Di heman demê de xalê min waneyên mûzîkê jî didan ez tevlî wan bûn, destpêkê ez fêrî bexlemê bûm. Sala 2015'an ve min dest bi lêdana tembûrê û stiranbêjiyê kir. Di sala 2017'an de ez tevlî Koma Erkê xweparastin bûm, li wir min li amûra nefxê dida navê wê Tirimpît bû. Li wir salekî mam û ez fêrî wê bûm. Her wiha di sala 2018'an de ez tevlî Koma Merasîman bûm a bi navê Akadimiya Mozîka Leşkerî û Pirotokolê û heya niha jî hîn ez vî karî berdewam dikim û amûra ku lêdidim Tirimbole. Di 2018'an ez tevlî koma mûzîkê ya bi navê Harmonî bûm û min li bexlemê dida, di wê komê de kurd, ereb, siryan û ermen hebûn, astengiyên ku li wir rastî me hatin ku cih nebû em li wir xwe fêr bikin, amûr tunebûn, di heman demê de derûniya me nerehet bû. Êdî her yek ji me bi cihekî ve Çû."

Mozîkjen Îvan Ibrahîm axaftinên xwe bidawî kirin û wiha got:"Niha jî ez li malê me carnan ez û birayê xwe bi hevre li amûrên mûzîkê didin. Ji ber rewşa ku em têre derbas dibin, wek astengiyekiye li pêşiya ku mirov bikaribe keyfê bike û stranan bêje. Di demên pêş de ez hewildidin gavên mezin bavêjim, awaz û peyv li cem min hene lê em jî li benda rewşa welatin ku aram bibe, da ku her kes xemil û xeyalên xwe pêk bîne û kurd bighêjin mafên xwe. Dema mirov ji tiştekî hez bike wê bi ser bikeve û gelek tiştan biafirîne, bi riya mûzîkê re mirov dikare hemû peyamên xwe bighîne. Heger tu bixwazê nasbikin ku miletek çiqasî pêşketiye, li mûzîka wê guhdar bike. Mirov bi hemû rewşên xwe berê xwe dide mûzîkê."

Sudoku: Bersiv 27

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 7 | 3 | 1 | 4 | 5 | 8 | 9 | 2 |
| 8 | 5 | 9 | 2 | 7 | 3 | 6 | 1 | 4 |
| 4 | 1 | 2 | 8 | 9 | 6 | 5 | 3 | 7 |
| 5 | 6 | 1 | 4 | 3 | 2 | 9 | 7 | 8 |
| 2 | 4 | 8 | 9 | 1 | 7 | 3 | 5 | 6 |
| 9 | 3 | 7 | 6 | 5 | 8 | 2 | 4 | 1 |
| 1 | 2 | 4 | 3 | 6 | 9 | 7 | 8 | 5 |
| 3 | 8 | 5 | 7 | 2 | 4 | 1 | 6 | 9 |
| 7 | 9 | 6 | 5 | 8 | 1 | 4 | 2 | 3 |

Sudoku:Pirs 28

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 4 | | 1 | | | 6 | |
| | | 7 | 6 | | | 4 | | 2 |
| 8 | | 6 | | | 5 | | 3 | 7 |
| 2 | | 1 | | 3 | | | | |
| | | | | 7 | | | | |
| | | | | 4 | | 6 | | 8 |
| 7 | 5 | | 1 | | | 2 | | 6 |
| 6 | | 9 | | | 8 | 7 | | |
| | 3 | | | 6 | | 9 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Navî mêr e kundê kor e:**
- Bi kêrî tiştekî nayê.

**Ne bi kêrî defê tê ne bi kêrî zirnê:**
- Ji tiştekî re nabe.

**Ne bi kêrî kerê tê ne bi kêrî kurtên:**
- Bi heman wateyê.

**Ne bi kêrî şevê tê ne bi kêrî şivê:**
- Bi kêrî tiştekî nayê; beredayî ye.

**Ne bi ser hev ve ye:**
- Bêserûber e; nelihevhatî ye.

**Ne dar e ne bizmar e:**
- Bi kêrî tiştekî nayê; beredayî ye.

**Ne dibe kiras ne dibe derpê:**
- Bi heman wateyê.

**Ne dîk e bang bide, ne mirîşk e hêkan bike:**
- Ji bo kesê yan tişta bi kêrî tiştekî neyê tê gotin.

**Ne gayê wê cilê ye:**
- Bi kêrî wî karî nayê; ji wî karî fêm nake.

**Ne kerê min e, ne gayê te ye:**
- Her du jî bi kêr nayên.

**Ne meşk e ne heban e:**
- Bi kêrî tiştekî nayê; beredayî ye.

**Ne şîrîn e bixwim, ne tehl e biavêjim:**
- Bi heman wateyê.

**Ne yê ber deriyan e:**
- Bêkêr e; xwîngerm e.

**Pere nekir:**
- Bandor nekir; bêsûd bû; guhê xwe nedayê.
- Bi kêr nehat; beredayî bû; li ber neket.

**Rûto ha li vî alê avê, ha li wî alê avê:**
- Kesê bi kêrî tiştekî neyê, here kû jî wê weke xwe be.

**Sa riye ga cûye:**
- Bi kêrî tiştekî nayê; berbat e; nahêje polekî.

**Seyê nizanibe bireyî guran tîne pêz:**
- Eger mirov ji karekî fêm neke û xwe nav re bike, zererê wî ji karê wî pirtir e; eger mirov karê xwe bi rêkûpêk neke, dijmin sûdê jê digire.

**Sêwiyê guhê gundan e:**
- Mirovekî beredayî ye; bi kêrî tiştekî nayê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Kar û xebata me ne bi qasî keda Rêber Apo ye'



Li Rojavayê Kurdistanê bi hezaran kesên ku Rêberê gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan dîtine, hene. Bi taybet kesên ku serdana mala Rêber Apo kirine û di civînên wî de amade bûne, heta roja îro jî li ser wê bigehê têkoşînê dewam dikin.**R-5**

## 'Şehîd Hîva Erebo dildara doza gelê xwe bû'

Hevseroka Partiya Yekêtiya Dîmokratîk PYD'ê Perwîn Yûsiv diyar kir ku şehîd Hîva Erebo yek ji pêşengên Şoreşa Rojava bû û di oxira şoreşê de gelek kar û xebatên giranbuha daye meşandin. Perwîn Yûsif da xuyakirin ku ew ê heta dawiyê şopdarên şehîdên xwe bin û doza wan bi serkeftinê tacîdar bikin.**R-6**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1248 | 16-Sibat-2025 | www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S

# EM Ê ROJA REŞ BIKIN ROJA AZADIYA RÊBER APO

Di salvegera Komploya Navnetewî ya li dijî Rêberê Gelan Abdullah Ocalan de, li her çar perçeyên Kurdistanê û seranserî cîhanê gelê kurd û dostên wan yên azadîxwaz daketin qadan û banga azadiya fîzîkî ya Rêber Apo kirin. Li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî, 4 meşên mezin û 5 mîtîngên biheybet hatin lidarxistin. Bi hezaran gel ji heft salî heta heftê salî berê xwe dan qadan û gotin: "Em ê Roja Reş Bikin Roja Azadiya Rêber Apo"**R-3**



## 'Wê Şoreşa Rojava muhra xwe li siberoja Sûriyê bide'



Rojnamevan û çalakvana kurd Emîne Hisên diyar kir ku Şoreşa Rojava şoreşa tevahî jinan e, şoreşê jin ji xewa giran a ku di bin pergala dagirker û koletiyê de bû; şiyar kirin û wiha got: "Şoreşa Rojava jiyaneke nû ji me re afirand û pêwîst e em dev ji têkoşîn û berxwedanê bernedin. "**R-2**

## 'Koma Serdem dê bi hunera xwe bavê Teyar bide jiyandin'



Helbestvan û yek ji rêveberê Navenda Çand û Huner a Serdem Ferhad Merdê da diyarkirin ku Çand û Huner a Serdem ji gelek aliyan ve deyndarê Bavê Teyar e û wiha got: "Şanoya kurdî mîrateya Bavê Teyar û Yekta Herekol e."**R-7**

## Welîd Dîngilî: Tiştê ku li Efrînê bûye yek ji planên dagirkeriya Tirk e

Endamê Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Welîd Dîngilî da zanîn ku sînaryoya ketina Hêzên Ewlehiya Hundirîn yên desthilatdariya Şamê di hundirê Efrînê de ne rast e, herwiha girêdayî plana Erdogan a li dijî gelê Kurd e.**R-4**





**Bi mêjiyê Baas-îxwanî Sûriya demokrat nabe!**

Mihemed Seydi R-4



**Hîna kilîta çareseriyê di destê Rêber Apo de ye**

Idrîs Henan R-5

# ‘Wê Şoreşa Rojava muhra xwe li siberoja Sûriyê bide’

**Rojnamevan û çalakvana kurd Emîne Hisên diyar kir ku Şoreşa Rojava şoreşa tevahî jinan e, şoreşê jin ji xewa giran a ku di bin pergala dagirker û koletiyê de bû; şiyar kirin û wiha got: “Şoreşa Rojava jiyaneke nû ji me re afirand û pêwîst e em dev ji têkoşîn û berxwedanê bernedin. ”**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Şoreşa Rojava bi pêşengtiya jinan veguherî hevgirtin û rêveberiyeke demokratîk ya ku ji etnîke û nasnameyên cuda yên weke Kurd, Ereb, Ermenî, Aşûrî-Suryanî, Çerkez, Tirkmen, Misliman, Xristiyan, Êzidî, Sunî û Elewî pêk tê. Di Şoreşa Rojava de ku jinan ji bo şoreşê gelek berdel dan, jinan di her alî de xwe birêxistin kirin û birêxistinbûna xwe berdewam dikin. Her wiha Di destpêka Şoreşa Rojava de jinên Kurd ên rojnamevan şerê zihniyeta civaka paviksalar kirin û bi ser ketin. Îro wê civakê li ser felsefeyek rast bi rêxistin dikin û dibin eynika civakê. Di aliyekî din de li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrîşê dagirkeriyê, pêkanîna komkûjiyan, sûcên şer ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve pêk tên. Jinên rojnamevan bi ked û têkoşîna xwe hewl didin rastiya ku tê jiyîn, ji raya giştî re raghînin. Bi vê ked, têkoşîn û fedakariya şehîdên rojnamevan. Îro felsefeya Jin Jiyan Azadî bûye felsefeyek cîhanê ku her jin azadiya xwe di bin vê felsefeyê de dibîne. Di vê çarçoveyê de Rojnemevan û Çalakvana kurd Emîne Hisên ku li Ispaniya dijî, ji Rojnemeya me re axivî.



**‘Jina îro ne jina berê ye’**

Emîne Hisên di destpêka axaftina xwe de balkişand ser rola jin di Şoreşa Rojvayê Kurdistanê de û wiha got: “Ev demeke ku ez hatim aliyê Rojavayê Kurdistanê ji bo şopandina rewşa ku niha Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê re derbas dibe ku ez bibim şahidê van rojan, bê guman şopandina min bi taybet li ser rol û misîyona jin di nava şoreşê de ye, ji ber ku Şoreşa Rojava bi keda jinê hat serxistin û li tevahî cîhanê deng veda û bû nimûne ji bo tevahî jinan. Belê wek tê zanîn û xuyakirin ku Suriyê ber bi pêvajoyeke nû ve diçe, ev pêvajo jî li ser jinê gelek metirsî avadike, her tim di hişê her jinekê de lêpirsîn tê çêkirin; wê rewşa jin ber bi kûve biçe û mafê wê di Sûriya nû de wê bi çi rengî be? Her wiha ev guman û pirs di serê me de tên avakirin, li kêleka van pirsan jî têkoşîn û berxwedaniya jin di asta herî jor de didome, ev jî hêviyekî pir mezin bi xwe re tîne ku wê jin bê maf nemîne. Jina îro ne jina berê ye, nema koletî û bindestî qebûl dike, berdêlên herî giran dan ji bo azadî û aşîtiyê. Lewma jin wê qebûl neke ku careka din vegere jiyana tarîtiyê û çarşefa reş li wê were kirin, ewê her bi têkoşîna xwe mafê xwe bi dest bêxe. Ji ber vê yek pêwîste dengê jinan bighêje tevahî cîhanê.”

**‘Jin bingiha civakê ye’**

Emîne diyar kir ku jin pêşengtiya şoreşa Rojava kir û xwe ji tevahî cîhanê re îsbat kir û wiha pê de çû: “Jina ku xwe di nava şoreşa Rojava de bi cih kir û bi rol û misîyoneke aktîf di hemû qadan de tevgeriya, ev jî da îsbat kirin ku jin dikare cihê xwe di her qadê de bigire û rêvebertiyê bike. Jin xwedî ked û hişmendiyeke xurte, bi hêsanî dikare civakê bi awayekî rast bi rêve bibe. Lê ew hişmendiya ku jinê biçûk û nezan dibînin, ew kes xwe dixapînin. Çawa ku maf ji zilam re hatiye dayin û bi serbest jiyana xwe dijî, bê guman ew maf ji bo hemû jinan e jî. De oxira guhartina vê hiûmendiyê de jinên Kurd di şoreşa Rojava de têkoşînekî mezin meşandin û ev hişmendî dan guhartin, bi taybet sekin û berxwedana jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye nimûne ji tevahî jinan re. Her wiha piştî ketina rêjîma Baas gelek guhetin hatin çêkirin, pêwîste di nav van guhertinan de mafê jin di destûra Sûriyê de were nivîsandin, bê guman eger mafê jinê di destûra nû de neyê nivîsandin, çareserî û aloziya Rojhilata Navîn jî bi dawî nabe. Ji ber ku ti jina îro qebûl nake xwe radestî zihniyeta dewletê bike, her ew ê li ser piya be û daxwaza mafê xwe bike. Bi felsefeya Jin, Jiyan, Azadî wê jin bigihîjin armanc û mafê xwe. Îro rola jin di nava civakê de girînge. Lewma bila her kes bizanbe ku jin ne nîvê civakê ye, ew civak bi xwe ye.”

**‘Dengê rastiyê ti carî nayê qut kirin’**

Rojnamevan û Çalakvana kurd Emîne Hisên di dawiya axaftina xwe de da xuyakirn ku dengê jinan û têkoşîna wan wê her zindî bimîne û got: “Em dibînin ku her rojnamevan tên hedefgirtin û bi taybet rojnamevanên jin, dijmin ji dengê rastiyê û vîna gelan ditirse, lewma rojnamevanan dike armanc û sûcên dijmirovî li ber çavê cîhanê pêk tîne. Lê belê her ku hevalekî me li ser riya rastiyê û dengê rastiyê şehîd dikeve, ev me zêdetir xurt dike. Bila dijmin ne fikire ku bi şehadeta rojnamevanan wê çavê me bişkîne an dengê rastiyê qut bike, em ê heya dawiyê şopdarê rojnamevanên ku ji bo dengê rastiyê canê xwe feda kirine bin. Her wiha pêwîste her jinek xwe berpirsiyarê vê şoreşê bibîne, ji ber ku serkeftina şoreşa Rojava, serkeftina mafê tevahî jinan e. Bê guman em ji hêz û îradeya xwe bawerin ku mafê xwe bi dest bixin. Ez wekî jineke kurd ku li Ispaniya dijîm û wek rojnamevan û çalakvan li wir kar û xebat dikim, wekî erka serke ji bo xwe dibînim ku dengê jinan li tevahî cîhanê belav bikim. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê şoreşa tevahî jinane ku ew ji xewa giran a ku dibin pergala dagirker û koletiyê de bûn; şiyar kirin. Ji ber vê yekê şoreşa Rojava jiyaneke nû ji me re afirand û pêwîste em her tim di nava têkoşîn û berxwedanê de bin. ”

# ‘Wê zincîra koletiyê careke din neyê girêdan’

**DiIîn Ehmed/Qamişlo**

**Berdevka Ofîsa Meclîsa Jin ya bajarê Amûdê Minewer Xalid da zanîn ku desthiladariya Şamê ya nû li şûna azadiyê, bindestî anî û wiha got: “Bi Berxwedana jin wê zincîra koletiyê careke din neyê girêdan.”**

Piştî hilweşandina Eseed rewşa Sûriyê bi giştî hat guhertin. Di demeke kin de gelek guhertin û veguhertin pêk hatin. Bê guman ev rewş rasterast bandora xwe li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî kir. Lewra ji bo parastina destkeftiyên Şoreşa Rojava gelê herêmê xebata xwe xurtir û zêdetir dike. Tevger û saziyên jinan jî, ji bo misogerkirina mafê jinê û parastina destkeftiyan xebatên xwe du qat zêdetir dikin. Ji ber ku desthilatdariya nû ya Şamê ew jî wekî desthilatdariya Eseed, dixwaze careke din di qada civakî, leşkerî, siyasî û çandî de rola jinê tune bike.

Derbarê vê mijarê de Berdevka Ofîsa Meclisa Jin ya bajarê Amûdê Minewer Xalid ji rojnameya me re axivî.

**`Pêşengên civakê nayên wendakirin`**

Minewer Xalid di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Piştî 12`salan ji şoreşê, wê tu hêz nikaribe rola me jinan têk bibe. Bila her kes vê yekê baş bizanibe. Her jineke ji me niha di civakê de xwedî îrade ye û xwedî roleke pir girîng e. Lewra her tim jin dibe armanca dijmin, çimkî bandora hêza jinê di civakê de heye û girîng e. Ji bo vê yekê divê tevahîya jinên herêmê her wiha jinên azadîxwaz li tevahiya cîhanê, bi kar û xebatên xwe çarenûsa xwe di pêşeroja Sûriyê de diyar bikin û derfetê nedin ti kesî ku vîna wan bişkînin.”

**Jin azadiya xwe di felsefeya Rêber Apo de dît**

Minewer Xalid balkişand ser azadiya jinan ya di fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Adullah Ocelan de û wiha got; “Destpêka Şoreşa Rojava bêtirî xwe ku jinên kurd pêşengî kirin û dest bi têkoşînê kirin, lê piştî avakirina hêza leşkerî YPJ`ê û avakirina sîstema Rêveberiya Xweser hemû jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê azadiya xwe û bidestxistin mafê xwe, di felsefeya Rêber Apo de dîtin. Ne tenê bûn mînaka gelê herêmê, herwiha jinên kurd li tevahiya cîhanê bû sembola jina azad. Ji bo vê yekê jî divê desthiladariya Şamê ya nû bighêje vê baweriyê ku ji bo civak azad bibe, divê berî her tiştî girîngiyê bide rola jinê.”

**`Piştî Şoreşa Rojava ti kes nikara îradeya me bişkîne`**

Minewr Xalid di dewama axaftina xwe de teqez kir ku desthilatdariya Şamê bi tinekirina rola jinê di civakê de, wê gelek pirsgirêkan bi xwe re bîne û wiha got: “Desthilatdariya Şamê dixwaze jinan sed sal din vegerîne paş, ev yek jî wê ti carî neyê pejrandin. Herwiha wê ev zihniyeta zilam ya di mejiê wan de, wê gelek pirsgirêkan derxe holê. Lewra jinê ku bi berxwedan û têkoşîn ev zihniyet şikand, wê careke din derfetê nede ku jinan bê îrade bike.”



Berdefka Ofîsa Meclîsa Jin ya bajarê Amûdê Minewer Xalid di dawiyê de wiha got: “Banga min ji bo jinan ev e li destkeftiyên xwe yê Şoreşa Rojava xwedî derkevin û soza xwe ya şopandina rêya şehîdan ji bîr nekin. Herwiha ya herî girîng ji hêz û îradeya xwe bawer bin, bi gotin û birayarên li dijî azadiya we bandor nebin. Jinên Rojava sembola jinên cîhanê ne, ev bar jî ne bareke sivike, divê em xewin û xeyalên hevalê xwe yên şehîd bi cîh bînin û tola wan li erdê nehêlin.”



# ‘Koma Serdem dê bi hunera xwe bavê Teyar bide jiyandin’

**Helbestvan û yek ji rêveberê Navenda Çand û Huner a Serdem Ferhad Merdê da diyarkirin ku Çand û Huner a Serdem ji gelek aliyan ve deyndarê Bavê Teyar e û wiha got: “Şanoya kurdî mîrateya Bavê Teyar û Yekta Herekol e.”**

**Navenda Nûçeyan**

Çand û Hûner a Serdem di sala 2017’an da girêdayi Erka Xwe Parastinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê avakirin. Di sala 2018’an de bi tevlîbûna Çand û Huner a Şehîd Osman ya Bavê Teyar a şanogeriyê kom tê mezinkirin. Gelek berhemên Çand û Huner a Serdem yên ku ji bona piştgirî didin şoreşê hene. Di komê de, du giropên stran, tîma bando û beşa şano cih digire.

Derheqê xebatên Navenda Çand û Huner a Serdem, di heman demê de jî, şahadeta şanogerê mezin û endamê Çand û Huner a Serdem Bavê Teyar (Cuma Xelîl) helbestvan û rêveberê Çand û Huner a Serdem Ferhad Merdê ji rojnameya me re axivî.

**Damezirandina Çand û Huner ya Serdem**


Navenda Çand û Huner ya Serdem di sala 2017’an de weke koma bi navê nihasîn tê avakirin. Di destpêka damezirandina xwe de, di bin sîwana Erka Xweparastinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dest bi kar û xebatên xwe dike. Endamên komê yên damezirandinê ji leşkerên erka xweparastinê pêkdihatin. Di sala 2018’an de weke komekê stranan xebatên xwe berdewam kirin. Piştre endamên şanoyê yên Bavê Teyar a şehîd Osman jî tevlî Çand û Huner a Serdem dibin. Çand û Huner a Serdem ya stran û şano tên birêxistin kirin. Bi TEV-ÇAND a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi rengekî hevpar xebatên xwe yên hunerî em didin meşandin. Mijarên berhemên komê civakî û jiyanî ne. Gelek berhemên komê yên li ser şoreşa Rojavayê Kurdistanê, êrîşên dagirkeriyê û piştgiriya şervanên QSD û YPJ’ê hene. Rojên pîroz yên navdar jî hunerên xwe pêşkêşî gelên herêmê dikin. Çand û Huner a Bando ya girêdayi Serdem jî xebatên xwe yên hunerî berdewam dikin û perwerdeya Çand û Huner a bando jî tên meşandin. Çand û Huner a Serdem hejmaran wan 33 kesin. Çand û Huner a şano ya Bavê Teyar ya bi navê Şehîd Osman jî berhemên xwe yên şano ji bona welatiyan pêşkêş dikirin. Bi tevlîbûna Çand û Huner a Bavê Teyar ya li Çand û Huner a Serdem hêzekî pir xurt dan endamên komê yên berê. Peymangehên hunerî hatin vekirin. Bi riya şano û stranan gelek ciwan tevlî şoreşa Rojavayê Kurdistanê bûn. Çand û Huner a Serdem bi tevlîbûna Çand û Huner a Şehîd Osman ya Bavê Teyar bû bingehekê mezin ji bona hunera Kurdî.

**‘Bavê Teyar rûkeniya mezin di dilê civakê de hişt’**

Helbestvan û yek ji rêveberên koma Serdem Ferhat Merdê anî li ser ziman ku Cuma Xelîl (Bavê Teyar) kesayetekê ku rûkeniyekî mezin di dilê civakê de hişt û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Kesayetên ku weke Cuma Xelîl mîrateyekî mezin yên gelerî ne û hebûna xwe di dilê gel de teqez kirin e. Bavê Teyar dema ku dikenand, di heman demê de jî mirov dida hizrandin û zanisteke mezin di nava civakê de dida afrandin. Demekê dirêje ku em Bavê Teyar nasdikin û me gelek kar û xebatên Çand û Huner a Serdemê bi hevre dane meşandin. Bavê Teyar hem şoreşger hem jî şanoger bû û şoreşgertiya wî rengekî cuda dida hunera wî. Ji temenê 7 heya 70’ê salî Bavê Teyar nasdikirin. Di komê de jî bandoreke mezin ya Bavê Teyar hebû. Dema amadekirina şanoyekê, heya nîqaşên jiyanî jî, bandoreke mezin di nav hevalên komê de kir. Em çawa jiyana Bavê Teyar vebêjin, em heya jiyankirina wî ya di nav kar û xebatê de nebêjin em nikarin jiyana Bavê Teyar pênase bikin. Cuma Xelîl yek jî damezrênerên Çand û Huner a Serdem a hunerî bû. Bi karakterê Bavê Teyar bû bavê Kurdistan ê. Bi dilekî wêrek û pir mezin çû bendava Tişrînê. Ev dilê mezin ê hunermendî ye.”

**‘Em ê Bavê Teyar bi domandina hunera Kurdî bidin jiyan kirin’**

Ferhad Merdê xebatên koma Serdem ên di dema pêş de bêne plansazkirin nirxand û wiha axaftina xwe qedand: “Çand û Huner a Serdem di rastiyê de jî, weke me li jorê anî ser ziman bingeha Çand û Huner a Serdem bi tevlîbûna Çand û Huner a Şehîd Osman xurttir bû. Ji bona pêşxistina komê stran tenê ne têrker bûn. Raste stran jî çandekî gelêrî ye, lê tenê



ne bes e. Em di mîrateya Yekta û Bavê Teyar li erdê nahêlin. Şano û filmên Bavê Teyar jiyana me dida hezkirin. Weke Çand û Hûner a Serdem jî projeyên filmên Bavê Teyar û ji bona piştgriya şervanên QSD û YPJ’ê stranên me yên şoreşgerî didomin. Çand û Huner a Serdem ji ber ku girêdayi saziya Erkaxweparastinê ne, parastina rewa û şerê gelê şoreşgerî jî di asta civakî de, pêşdixin. Ji ber ku huner jî qadeke ku têkoşînê digihîne lutkeyekî bilind. Em ê bi mîrateya Bavê Teyar ya şanoya Kurdî berdewam bikin û bi ti awahî nahêlin rûkeniya zarok û civaka Kurdistanê vemire. “

# Şopên jiyana komînal a civaka Kurd: Şevbêrk

**Dengbêj û çîrokbêj, li bajarê Dêrika ku civaka komînal û hevpar lê zindî ye, bi şevbêrkan, ruh û hestên dîroka kevnar û civakî ji nûve vedijînin.**

Di çanda Kurdan de gelek şopên jiyana kevin a komînal hene. Yek ji vê çanda kevnar jî şevbêrk in. Bi taybetî bi hatina payîzê re ji ber ku kar û xebatên ji derve tên kirin ên mîna çandinî û hwd. namînin, endamên civakê li hev kom dibin û di şevên dirêj de şevbêrik li dar xistin. Di vê kombûnê de kesek ji şevbêrkan re pêşengiyê dike û birêve dibe. Di şevbêrkan de mîna hemû karên komînal ên di nava civakê de jin û mêran bi hev re stranên dengbêjiyê gotine û li hev vegerandine. Di nava civakê de ji payîzê heta demsala Biharê gotin di cih de be her roj li malekê şênî dicivin bi çanda şevbêrkan dîrokê derbasi nivşê nû dikin. Bi rêya dengbêjî û çîrokên kevnar çandê derbasî siberojê dikin. Bi riya van dengbêjan civaka Kurd a di hemû kar û xebatên xwe de



jiyana komînal esas girtiye, bi vê çandê şevên xwe bi kêfxweşî derbas kirine û ji dîroka xwe haydar bûye. Bi riya şevbêrkan dîrok û çand nifş bi nifş anîye îro û derbasî siberojê dike.

Hê jî gengaz e ku mirov şopên jiyana komînal a kevnar bibîne. Li bajarê Dêrikê yê Rojavayê Kurdistanê, em îro dibînin ku hê jî berhemên civaka komînal a kevnar lê zindî ne. Dengbêj û çîrokbêjên ku di hemû gotinên xwe de dîrokê vedibêjin ji bo ajansa me şevbêrkek li dar xistin. Di şevbêrkê de dengbêj Helîm Mihemed yê ji gundê Besta Sus, Xanê Evdila Hisên a ji gundê Besta Sus, Hazim Derwîş yê ji gundê Mêrga Mîra, Elî Yûsif ê bi eslê xwe ji Cizîra Botan e, bi stran, dengbêjî û çîrokên xwe şeveke rengîn û dewlemend ji me re hiştin.

**Bi riya şevbêrkan vegotina dîrokê**

Dengbêj Hazim Derwîş bi dengbêjiya ‘Helya Mîro’ şevbêrk da destpêkirin. Piştî dengbêjiyeke bedew a ruhê me germ kir dengbêj Elî Yûsif li ser şevbêrkên ku di dîroka Kurdan de ciheke girîng girtiye şîrove kir. Elî Yûsif got “Em ê niha li ser Efun û Hêjal bibêjin” û dengbêj dest bi dengbêjiya xwe kir. Paşê dengbêjên jin Helîm Mihemed û Xanê Evdila Hisên dengbêjiya ‘Memanî’ strîn.

**Serpêhatiya Sultanê**

Şevbêrkên ku bi dengbêjiyê dewlemend dibin bê çîrok nabin. Li ser vê yekê dengbêj Hazim Derwîş çîroka ‘Siltanê’ ya ku tê gotin li Botanê jiyaye û parçeyek ji serpêhatiya wan çaxan vedibêje got. Strana dengbêjiyê jî li ser çîroka bi êş ya Sultanê ku bi darê zorê tê zewicandin, tê strîn. Dengbêjan paşê him stranên xwe gotin him jî li hev vegerandin.

**‘Em ê nehêlin bê jibîrkirin’**

Xanê Evdila Hisên ya di şevbêrkê de li ser parastina çandê axivî wiha got: “Çanda me çandeke pîroz e. Divê em tu caran bêxwedî nehêlin. Ji bo parastina vê çandê çi ji me bê em ê bikin. Berê ji xeynî vê çandê tiştekî me tunebû. Stranên dawetan hemû bi devkî dihatin gotin. Em ê nehêlin ev kevneşopî bê jibîrkirin.”

**‘Divê bên parastin’**

Elî Yûsif bi gotina; “Me xwe bi vê çandê parast û em heta îro hatin” bal kişand ser parastina çandê û ev tişt got: “Nifşekî xebitî bo ku nifşeke din bigihîje serdema pênûs û lênûsan. Hêviya me ji helbestvan û nivîskarên me ew e ku vê çandê binivîsînin bikin pirtûk û li dibistanan li ser wan ders bidin ji bo şagirtên me jî bixwînin û fêrî çanda xwe bibin. Hûn bixêr û silamet hatin vê şevê. Di werza havînê de bi şevbêrka dengbêjên ji Dêrikê em jî bi dengbêjî û çîrokên hatin gotin hinek din hay ji çanda xwe bûn. Em jî di wê hêviyê de ne ku ruxmê hemû polîtîkayên bişaftinê yê li ser çand û dîroka me Kurdan çawa ku çanda me gihiştibe van rojan, di roja me de jî li dijî van polîtîkayan bi parastina çand û kevneşopiyê em bikaribin bigihînin pêşerojê. **NÛ JINHA**

# ‘Şehîd Hîva Erebo dildara doza gelê xwe bû’

Hevseroka Partiya Yekêtiya Dîmokratîk PYD’ê Perwîn Yûsiv diyar kir ku şehîd Hîva Erebo yek ji pêşengên Şoreşa Rojava bû û di oxira şoreşê de gelek kar û xebatên giranbuha daye meşandin. Perwîn Yûsif da xuyakirin ku ew ê heta dawiyê şopdarên şehîdên xwe bin û doza wan bi serkeftinê tacîdar bikin.

**Dîlan Mulhim\ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker di êrişên xwe yên li ser gelê kurd de, bi taybet jinên pêşeng dike hedef. Herî dawiyê di encama êrişeke dagirkeriyê de li ser Başûrê Kurdistanê jina pêşeng Hîva Erbo şehîd bû.



**Kurte jiyana şehîd Hîva Erebo**

Têkoşer Hîva Erebo di sala 1981’an de li bajarê Dirbêsiyê ê Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. Di malbateke welatparêz û bi çanda xwe û zimanê û nasnama xwe ve girêdayî mezin bû. Malbata wê hîn ji temenkî biçûk ve ew li ser nirxên şoreşa gelan û felsefa jina azad perwerde kir, herwiha di temenê 16 Salî de beşdarî xebatên siyasî dibe û di nava xebatê rêxistinkirina gel de cih digre. Weke jineke ciwan a Kurd ji bo azadiya gelê xwe û azadiya jinan di sala 2000’î berê xwe da çiyayê Kurdistanê yên azad. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava û damezrandina Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê wekî pêşengekê kar û xebat kir û di gelek qadan de bi rola xwe rabû. Di 27 çileya 2025 `an de dema ku endama Koordînasiyona PYD’ê Hîva Erebo çûbû Başûrê Kurdistanê bi armanca ku bi rêxistinên jinan re hevdîtin bike, ji aliyê dewleta Tırk ve hate hedefgirtin û di encamê de şehîd bû.

Di derbarê kesayet, kar û xebatên Şehîd Hîva Erebo, hevriya wê hevseroka Partiya Yekêtiya Dîmokratîk PYD’ê Perwîn Yûsiv ji Rojnameya me re axivî.

**Kar û xebatê Şehîd Hîva Erebo**

Perwîn Yûsiv anî ziman ku ji destpêka şoreşa Rojava ve şehîd Hîva Erebo kedeka mezin daye û got: “ Şehîd Hîva Erebo di nava kar û xebatên xwe de nirxê civake azad û dîmokratîk bingeh girt û ji bo wan nirxan têkoşîna xwe berdawam dikir. Şehîd Hîva di gelek saziyên Rêveberiya Xweser de kar û xebat dida meşandin û cihê xwe di mecils, komîn û desteyên jinan de girtbû. Ji dema damezrandina Rêveberiya Xweser ve heval Hîva Erebo yek ji jnên pêşeng ên Rêveberiya Xweser bû û di destpêkê de cihê xwe di kondirasyona Desteya Jin de girt. Wê di nava xebatên Desteya Jin de xweseriya jin diparast û hêz dida jinê ji bo ku karibe rêvebertiyê bike. Di dawiya sala 2015`an de weke hevseroka kantona Cizîrê cihê xwe girt û di vî karî de têkoşîneke mezin kir. Di heman demê de ji bo jinên kurd û ereb civîn çêdikrin, di got em weke jin doz û azadiya me yeke. Wê tekez dikir û digot pêwîste yekîtiya gelan ava bibe û li ser vê bingehê gelek kar birêvebir. Dema komkojiya li Şengalê hate kirin, ji bo pêşewazîkirina gelê Şengalê, wê cihê xwe di rêveberiya kampa Newroz de girt û destek û piştgirî da gelê kurd yê Êzdî. Li her cihê Bakur û Rojhilatê Sûriyê kengî kar û xebat dihat xwestin, şehîd Hîva pêşeng bû û bi erka xwe radibû.”

**‘Armanca dewleta Tirk têkbirina destkeftiyên şoreşê ye’**

Perwîn Yûsiv da zanîn ku dewleta Tirk a dagirker ji destpêka şoreşa Rojava ve êrişî destkeftiyên gelan dike û wiha domandin: “Ji bo têkbirina şoreşê dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe bênavber dewam dike. Dewleta Tirk a faşîst hertim




pêşengên şoreşê dike hedef. Ew di êrişên xwe de bi taybet rengê jina azad dike hedef, ji ber ku jin îro civakê birêve dibe û birêxistin dik. Di heman demê de armanca dewleta Tirk têkbirina pirojeya Rêveberiya Xweser û destkeftiyên şoreşê ye, ew dixwaze bi rêya hedfgirtina jinan ku pêşengiyê ji şoreşê re dikin, şoreşê têk bibe. Dewleta Tirk a dagirker zagonên mafê mirovan binpê dike. Ji ber wê pêwîste dewleta Tirk a dagirker di dagehên navnetewî de wer dagehkirin. Herwiha pêwîste cîhan û bi taybet tevgerên jin bê deng nemînin. Bêdengiya hêzên navnetewî rê dide dagikeriyê ku sûcên xwe dewam bike û jin û zarokan jî qetil bike. Bêdengiya navneteweyî û bi taybet ya hikumeta Başûrê Kurdistanê cihê şermezariyê ye.”

**Bandora şehadeta şehîd Hîva Erebo**

Hevseroka Partiya Yekêtiya Dîmokratîk PYD’ê Perwîn Yûsiv axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Banga me ji hêzên navnetwî re heye ku bi erkê xwe rabin û rê li ber hedefgirtina jinan bigirin. Herwiha şehadeta Hîva Erebo bandoreke mezin li civakê û li ser me kir, di heman demê de Hîva Erebo dildarê gel û soza xwe bû. Li ser vî bingehî emê heta dawiyê li ser şopa şehîd Hîva Erebo berxwedaniyê berdewam bikin û doza ku wê daye meşandin bi serkeftinê tacîdar bikin.”

# Mihsin Gawî: Wênekêşî parçeyek ji giyanê min e

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

**Rahêner û wênekêş Mihsin Gawî diyar kir ku wênekêşî dewamkirina jiyanê ye û wiha got: “Rojek bi ser min re derbas nabe ku ez wêneyan nekişînim ji ber ku bûye parçeyek ji giyanê min.”**



Mihsin Gawî temenê wî 18 salin, ew ji bajarê Qamişlo ye. Tevî ku ew kesekî astengdare lê dev ji xewn û xeyalên xwe bernade. Ji sala 2020’an ve dest bi fêrbûna wênekêşiyê kiriye.
Mihsin Gawî di derbarê jiyan û karê xwe ji rojnameya me re axivî.

**Kar û xebatên Mihsin Gawî**

Mihsin Gawî da zanîn ku astengdarî ne ya bedenê ye lê ya hişmendiyê ye û wiha got: “Di sala 2020’an de ez li UNCEF beşdarî pewerdeya wênekêşiyê bûm, du heftiyan berdewam kir, him tewrî û him jî piratîk bi taybet ji bo kesên astengdar bû. Em 14 kes tevlî vê perwerdeyê bûn û mamosteyê me jî Azad Evdikê bû, di vê perwerdeyê de ez fêrî rêzikên bingehîn yên wênekêşiyê bûm. Êdî min kamîreyek kirî û dest bi projeyek taybet kir û ez jiyan û taleneta kesên astengdar bikşînim. Ev Proje li ser wênekişandin û belgekirina jiyan û jêhatîbûna kesên astengdar bû, da ku ez ji civakê re nîşan bikim ku ew jî xwedî şiyan û potansiyel in û dikarin gelek tiştan bikin. Bi rêya belge û medyayê min karî nêrîna cîhanê ya neyînî li ser van kesan veguherînim erênî. Piştî ku min xwe pêş xist, êdî ez bûm rahêner min zêdetirî 50 kesên astengdar û normal perwerde kirin. Di heman demê de min di rêxistina Nûdem, navenda Fînîqiya û komeleya Şawîşka de jî wane li ser wênekêşiyê dan. Di sala 2022’an de bi boneya Roja Cîhanî ya Astengdaran min belgefilmek li ser astengdaran çêkir, ev belgefilm bi 14 zimanên cîhanî hatibû wergerandin û li 15 welatan hat pêşkêşkirin. Her wiha li gel tîma Tîtra Hînar û bi Yekîtiya Jinan re me şano li ser kesên astengdar pêşkêş kirin. Bi armanca hişyarkirina civakê li ser kesên astengdar. Ji bo daxwazkirina mafên kesên astengdar, li Minbic û Qamişlo beşdarî konferansa furman bûm. Her wiha ji hêla UNCEF ve hatim xelatkirin di sala 2021’ê de wek baştirîn kesê astengdar li Bakur û Rojhilatê Sûriyê”.

**‘Wênekêşî û çapemenî cewherê jiyanê ne’**

Rahêner û wênekêş Mihsin Gawî axaftinên xwe bi van gotinan bi dawî kirin: “Wênekêşî û çapemenî cewherê jiyanê ne û mezintirîn navgînên belgekirinê li cîhanê ne. Belgekirina bi wêne û vîdiyo baştirîn rê ye ji bo mirov û civakê bawer bike. Min di jiyana xwe de ev kar kir û min dikarî vê rêyê berdewam bikim bi saya bav, dayîk, heval û mamosteyê min yê ku ez ji xwe re mînak dibînim Azad Evdikê bû. Lê ev demek e ez dûrî rûpelên xwe ketime, lê ez ne dûrî rastiyê me. Niha ez di hişmendiya xwe de li ser projeyên nû dihizirim û dixwazim gavên mezin biavêjim ku sûdê bidin kesên astengdar. Ez niha li bendê me ku rewşa welat aram bibe ku ez bi hêzeke xurt dest pê bikim. Wê di demên pêş de gelek şano û belgefîlim werin çêkirin. Peyama min ji bo her kesê astengdar ew e ku tu carî bedena xwe ji bo xwe nekin astengî, em ê hemû bi hev re bighêjin hemû hêvî û daxwezên xwe. Her wiha em ê ji derdorê re tekez bikin ku em dikarin her tiştî bikin”.



# Em ê roja tarî bikin, roja azadiya Rêber Apo

Bi pêşengiya Însyatîfa Gel ya kantona Cizîrê, li kêleka stadyuma şehîdên 12`ê Adarê mîtingek girseyî ya bi dirûşmeya “Em ê roja tarî bikin, roja azadiya Rêber Apo” hat lidarxistin. Bi tevlîbûna sedan şenîyên Kantona Cizîrê û endamên sazîyên Rêveberîya Xweser çalakî heya direngiya demê hat domandin.

**Argêş Viyan/Qamişlo**

Miting bi xuleya rêzgirtinê ya ji bona ku şehîdên şoreşê û pêngava “Hûn nikarin Roja me Tarî Bikin” destpêkir. Qada mîtingê bi wêneyên Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan hatibûn xemilandin.Welatiyên ku bi cilê gelerî tevlîbpna xwe ya meşê kiribûn dîmenên coş derxistin qada mîtingê. Di mîtingê de, endama Desteya Rêveber a Hevseroktiya PYD’ê Foza Yusif û li ser navê pêkhateyên Ereb jî endamê Ruspiyên êla Teyî ya Kantona Cizîrê Hesen Ferhan bi zimanê Erebî axivîn. Di mîtingê de peyamên Rêber Apo yên ji bona silavkirina gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê Foza Yusif ve ji girseyê re hat ragihandin û Berxwedana Bendava Tişrînê hat silavkirin.

**‘Silavên Rêber Apo yên germ ji gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên berxweder hene’**

Endama Desteya Rêveber a Hevseroktiya PYD’ê Foza Yusif ji girseya ku tevlî mitîngê bibûn silavên Rêber Apo gotin û wiha



**Foza Yûsif**

axivî: “Pêvajo pir hesase û pir hesab li wê pêvajoya ku Rêberê gelan Rêber Apo pêşengtiye jê re dike tên kirin. Eger dewleta Tirk û rayedarên hikûmetê ev derfeta ku Rêber Apo gelê kurd û Tevgera Azadiyê re danûstandinê ne de avakirin û Rêber Apo rewşa dîlgirtinê de dernekeve ev pêvajo nagihije serkeftinê. Dema ku êrîş û şer hebe em dîsa nikarin qala aşitîyekî mayinde bikin. Rêber Apo mîmarê azadiyê ye û mifteyê çareseriyê li gel Rêber Apo ye. Rayedarên dewleta Tirk ya dagirker dibêjê bila Rêber Apo daxuyaniyekê bide, ji bona ku Tevgera Azadiyê çek berde. Lê tenê bi daxuyanîyekê em nikarin tevgerekî şoreşgeriya 45 salan zêdetir dike û şerê çekdarî dimeşîne çek bidin berdan. Pêwîste



**Hesen Ferhan**

hemû aliyên ku peywendîdar ciddî nêzî Rêber Apo bibin. Dîsa Rêber Apo silavên germ ji were şandine û berxwedaniya gelê me silav kirine. Em hezar caran silavên Rêber Apo hembêz dikin û sozê didin Rêberê xwe em ê fizikî azadiya Rêber Apo mîsoger bikin. Rêber Apo jina kurd û jinên herêmê li cîhanê dan naskirin. Ev bû sedem ku modela Rêveberiya Xweser û projeyên jinê di nav cîhanê de bibin model. Ji ber ku zarokên 7 salî û heya kalên ku temênê wan 70’ê salî ji bona azadiya Rêber Apo di nav tevgerekê xurt dan e. Bi rastî jî, bi ramanên rêberê rojê ev gel bûn şoreşger û niha bi şêwaza şêrê gelê şoreşgerî berxwe didin. Em dîsa şehîdên “Hûn nikarin Roja me Tarî Bikin” û yên Bendava Şehîdan




xwe kirine pêşengên gel bibîrtînin û bejna xwe li ber wan ditewînin.”
Di heman demê de Endamê Ruspiyên êla Teyî ya Kantona Cizîrê Hesen Ferhan di axaftina xwe de anî li ser ziman ku Rêber Apo ne tenê Rêberê gel û netewekê ye, Rêber Apo Rêberekî cîhanî ye û wiha axivî: “Rêber Abdullah Ocalan bi fikir û ramanên xwe bûye Rêberekî gerdûnî û cîhanî. Em bi fikir û birdoziya Rêber Apo di asta navnetewî de bûne bi nav û deng. Ev serkeftineke mezin ya gelên herêmê ye. Em Ereb, Siryan, Ermen û Tirkmen di bin paradigmaya Rêberê gelan de weke xwuşk û bira jiyan dikin û ti cara ev aramiya gelê herêmê xirab nabe. Ji ber ku bingehek xurt û bawerîyekî mezin hatiye avakirin.”
Mîtîngê bi stranên Hûnergeha Welat ya bi navê “APO û Bendava me ye” coşekê mezin di nav girseyê de dia ava kir. Mitîng bi dirûşmeyên “Bê Serok Jiyan nab e, Bîjî Serok Apo û Bijî berxwedana QSD’ê” hat bidawî kirin.

# Parêzer Niêmî: Ev lêlê ye hîna lolo maye

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Parêzer Mihemed Emîn Niêmî diyar kir ku dem dema dadgihkirina dewleta Tirk û hemû serkêşên wê ye û got, “Hemû dosiyayên binpêkirinan di destên kesên ku adaleta cîhanî dişopînin û saziyên xwedî rol de ne, Dadgeha Birûksilê gaveke girîng bû, lê ev lêlê ye hîna lolo maye.”**

Di 5’ê Sibatê de bi navê ‘PERMANENT PEOPLES` TRAIBUNAL ROJAVA VS. TURKEY’ dageheke li Belcîka, bajarê Birûksil hat lidarxistin. Ev yek jî bi pêşengtiya çend sazî û kesayetên dozgerî yên cîhanî, rêxistinên Almanî, Belcîkî, dozgerên cîhanî û 10 saziyên kurdî dest pê kir. Dadgeh ji bo cezakirina dewleta Tirk, çeteyên wê, serokê Tirkiyê Erdogan, wezîrê derve yê Tirkiyê Hakan Fîdan, serokê MÎT a Tirkiyê Ibrahîm Galîn, wezîrê berevaniyê Yeşar Coler û hin kesên din. Ev dadgeh ji bo destpêkirina cezakirina dewleta Tirk a dagirker a sûcdar li dijî gelê kurd û hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi dirêjahiya Şoreşa Rojava kiriyarên qirêj daye meşandin.
Ji ber dewamiya êrişên dewleta tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, parêzer û saziyên mafê mirovan



hewldanên mayinde dikin da ku ev dagirkerî were cezakirin. Derbarê heman mijarê de parêzer Mihemed Emîn Niêmî ji rojnameya me re axivî.

**‘Dewleta Tirk berî 2011’an jî kurdên Rojava dikuştin’**

Niêmî da zanîn ku dewleta Tirk ji salên berî 2011’an ve sivîlên kurd li Rojava qetil dike û wiha got: “Li seranserî sînorê Rojava û Bakurê Kurdistanê bi dirêjahiya 900 kîlomtreyan, ji demeke mêj ve dewleta Tirk gelê kurd kiriye hedef. Berî sala 2011’an û destpêkirina Şoreşa Rojava sûcên giran di derheqê sivîlan de dihat kirin. Nemaze em bêjin dema ku cotkar, şivan, jin, zarok diçûn nêzî sînor ji bo karê xwe yê lawirvanî an jî çandinî dikirin, cendermeyên Tirkiyê ew dikuştin. Lê dema şoreşê dest pê kir bi awayekî rojane, fermî û rasterast dewleta Tirk dest bi kujeriyê kir. Eger em vegerin li kiriyarên Impratoriya Osmaniyan binêrin û hevrûkirinê di navbera wan kiriyaran û yên piştî şoreşê heta niha de bikin, dê were xuyakirin ku kiriyarên serdema îro gelekî xirabtir in. Bi taybet piştî destpêkirina şoreşê û damezrandina Rêveberiya Xweser dewleta Tirk bi giranî sûcên dijmirovî dan meşandin. Bê sûc û sedem dîsa kesên sivîl bûn hedef. Heta vê kêliyê jî dewleta Tirk êrişî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike, pê re komkujî û hedefgirtin li ser gelên herêmê tên kirin.”

**‘Belgeyên binpêkirinan gihane ber destê saziyên hiqûqî ên cîhanî’**

Mihemed Emîn Niêmî diyar kir ku belgeyên binpêkirinên dewleta Tirk hemû amade ne û wiha domand: “Bê guman dewleta Tikr ji destpêka şoreşê ve dijberiya gelê kurd û hemû pêkhateyan dike hedef. Lê bi dagirkirina Efrînê û şûn de sûcên mezin hatine kirin. Li gorî zagonên navnetewî yên parastina mafê mirovan eger dewlet êrişî dewleteke din bike, nayê qebûlkirin. Lê dewleta Tirk û çeteyên wê, li Efrînê gelek komkujî kirine, xelkên wê bi darê zorê koçber kirine, herwiha çekên cehrê li ser gel bi kar anî. Em dizanin tiştê ku li Efrînê çêbû yek ji dosiyayên dewleta Tirk di warê binpêkirina gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ye. Lê belê gelek dosiyayên din hene û tê de jî dagirkerî û li ser asta cîhanê sûcdareke mezin tê hesbandin. Kiriyarên dewleta Tirkr a dagirker bi giştî hatine belgekirin, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî her kes û her saziyek ji saziyên Rêveberiya Xweser, rêxistinên sivîl, parêzer, Hêzên Ewlekariya Hundirîn û hwd… êriş, komkujî û hedefgirtinan bi belge dike. Hemû dosiyayên binpêkirinên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê di derheqê herêmê de belgekirî ne. Herwiha ev belge hemû di destên kesên ku adaleta cîhanî dişopînin û saziyên xwedî rol de ne. Em tekez dikin ku wê darzandin çêbibe, pendeke kurdî heye dibêje “Ev hîn lêlê ye, hîna lolo maye”, lewma jî wê ji wiha girantir dewleta Tirk, serkêş û serokên wê bêne cezakirin.”

**‘Saziyên mafê mirovên êdî sînorê bêdengiya li hemberî Tirkiyê dişikînin’**

Parêzer Mihemed Emîn Niêmî destnîşan kir ku li hemberî kiriyarên dewleta Tirk sînorên xwe yên bêdengiyê şikandin û wiha axivî: “Wekî em dizanin berî demeke kurt Dadgeha Birûksilê ya ji bo darzandina dewleta Tirk hat lidarxistin, gelek dosiyayên binpêkirinan tê de hatin pêşkêşkirin. Ev dadgeh jî di encama hin sedeman de li darket, yek jê berxwedaniya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet li Bendava Tişrînê ye, hem jî pirbûna kiriyarên binpêkirinên dewleta Tirk li dijî sivîlan bû. Di heman demê de bi saya fikr û felsefeya Rêber Apo ya ku li cîhanê deng veda, hat lidarxistin. Êdî dem dema dadgeheke wiha bû, hemû dosiyayên kevin û yên hemdem pêkhatî û amade ne. Tevahiya cîhanê kiriyarên dewleta Tirk û çeteyên wê, dişopînin. Ji sazî û rêxistinên parastina mafê mirovan ên cîhanî re hate xuyakirin ku dewleta Tirk dixwaze gelên Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê tune bike. Ev dadgeh, gaveke girîng bû ji bo Rojavayê Kurdistanê û tevahiya parçeyên din, dosiyayên ku hatin pêşkêşkirin fermiyeta xwe standin. Êdî binghek hate avakirin ji bo lidarxistina sê dadgehên cîhanî, yek jê Dadgeha Dadmendiya Navnetewî, Dadgeha Sûcên Navnetewî, Dadgeha Stasborgê ya Mafê Mirovan. Bi vê yekê em dibînin ku saziyên navnetewî yên parastina mafê mirovan li hemberî kiriyarên dewleta Tirk sînorên xwe yên bêdengiyê şikandin.”

# Welîd Dîngilî: Tiştê ku li Efrînê bûye yek ji planên dagirkeriya Tirk e

Endamê Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Welîd Dîngilî da zanîn ku sînaryoya ketina Hêzên Ewlekariya Hundirîn yên desthilatdariya Şamê di hundirê Efrînê de ne rast e, herwiha girêdayî plana Erdogan a li dijî gelê Kurd e û wiha got: "Baweriya me bi hêz û siyaseta me heye û em ê vegereke bi ewle û bi rûmet misoger bikin"

**Esma Mistefa/ Qamişlo**



Di van demên dawiyê de hate xuyakirin ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn yên HTŞ'ê derbasî herêma Efrînê bûne û tevahî komên çete wê derkevin. Lê hate eşkerekirin ku komên çete û HTŞ'ê bi destwerdana Tirkiyê ev sînaryo dîzayîn kiribûn. Girêdayî vê yekê Endamê Meclîsa Giştî ya PYD'ê Welîd Dîngilî bersiva pirsên rojnameya me dan.

**Hûn pêvajoya niha û planên qirêj ên li Efrînê li ser gel tên meşandin çawa dinirxînin?**

Belê; Bûyerên ku beriya demekê di Efrînê de hatine rûdan, helbet sînaryoyek li ser hatibû lihevkirin di navbera çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk û hikûmeta Şamê de. Gelê Efrînê bi van planan hate xapandin.

Xwedê giravî wê Hêzên Ewlekariya Hundirîn yên HTŞ'ê li hember komên çete yên girêdayî Tirkiyê derkevin?! Lê tişta ku hatiye rûdan ne wisa bû. Tenê çend erebeyên wan çeteyan û hejmarek kêm ji Hêzên Ewlekariya Hundirîn pê re hebûn. Bi vê sînaryoya xapînûk navçe bi navçe, gund bi gund geriyan û ji xwe re propaganda çêkirin û vegeriyan bajarê Helebê. Bê guman gelê me yê li wir gelekî kêfxweş bibû û ev yek li pêşiya her kesî bi rakirina ala Kurdistanê nîşan dan, weke ku ev pêvajo bibe pêvajoya aşîtiyê û gelê me wê bi rengê xwe li wir nefes bistîne. Lê mixabin piştî bidawîkirina vê planê ew kesên ku kêfxweşiya xwe raber kiribûn, yek bi yek têne girtin û îşkencekirin. Her wiha tewanên derew li wan hatine kirin, weke hemû çalakiyên ku di Efrînê de hatine kirin wan kiriye û ew girêdayî hêzên QSD'ê ne, rûxmî ku kesine sivîlin lê heyanî niha jî rewş û cihê wan ne diyar e û bace ji malbatên wan tên xwestin. Gelê me di Efrînê de divê ji siyaseta dagirkeriyê û komên çete serwext be. Ev hemû plan û derewên dagirkeriyê ne dixwazin pê Raya Giştî û gelê Kurd bixapînin. Divê gelê me vê yekê zanibe, HTŞ û hemû komên çete di bingeh de bi hev ve girêdayî ne. Yek sûcekî dike yê din piştgiryê dide, yek dişidîne û yek jî nerm dike, û wê ti carî li hember hev jî nesekinin. Ev pêvajo divê ji aliyê gelê me ve baş were nirxandin û analîzkirin û hîn zêde em şiyar bin. Divê em dîroka van çeteyan lêkolîn bikin ku hê baş rastiya wan nas bikin.

**Armanca desthilata Şamê û komên çete yên li Efrînê ji van planan çi ye?**

Divê em zanibin ka armanca HTŞ û komên çete ji vê planê çi ye? Plan ne ser bi xwe ye. Ne HTŞ û ne jî komên çete bi ser xwe dikarin gavekî wisa bê destûra Erdogan biavêjin. Yanî bavê hemû planan istixbarata Tirkiyê û Erdogan e. Ji ber wê jî dive em planên Erdogan zanbin. Bi siyasetên wisa çi dixwazin bi dest bixin? Erdogan di planên xwe yên li ser Efrînê de bi bin ket ku nikarîbû guhartinek demografîk û etnîkî çêke û rengê gelê Kurd li wir tune bike. Ji ber wê jî niha bi heman armancê dest bi planên nû dike.

Niha bi awayekî ters piştî hilweşîna rêjîma Esed piraniya gelê ku derbasî Efrînê bûye û bi cih bûye, vedigerin mal û bajarên xwe. Wê demê Efrîn hêdî hêdî vala dibe. pêvajoya vegerandina gelê Efrînê ya bi ewle yê ku ji 7 salan ve bi darê zorê ji Efrînê derketiye derdikeve pêş. Bê guman li hember van guhartinan û pêşveçûnan wê Erdogan bê plan nemîne. Erdogan careke din şêwazê tundiyê û zorê di Efrînê de dide avakirin. Bi taybet piştî guhartinên ku hatine jiyankirin; atmosferek rihetiyê hate avakirin. Lê Erdogan dixwaze tirseke nû di dilê gelên herêmê yên hundir û derve de ava bike. Li ser van bingehan divê gel jî li hember van siyasetan hişyar be. Me gelek li ber xwe da, li kêlek êş û zehmetiyên rastî gel hatine lê me têkoşîneke pir mezin jî meşand. Ev dem girîngtirîn dema ku em bi awayekî serwext û bi zanebûn nêzî pêvajoyê bibin. Ji ber ku armanca Tirkiyê li hember gelê me ti carî nayê guhartin û wê hewl bide li gorî pêvajoyê taktîkên nû bixe dewrê.




**Li gorî çavkaniyan binpêkirinên li Efrînê bê navber dewam dikin, hûn bêdengiya navneteweyî ya li hemberî wê çawa şîrove dikin?**

Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve û hemû kiryarên bê mirovî li ser gelê resen têne pêkanîn. Kiryarên dagirkeriyê û sûcîn şer ên girtin, kuştin, revandin û guhartina demografîk nehatin rawestandin. Tirsa ku hatiye avakirin jî heyanî vê kêliyê berdewam e.

Li hember van sûc û kiryaran divê em berê xwe bidin Raya Giştî, rêxistin û hêzên navnetewî ku divê xwe berpirsiyar bibînin. Lê pirsa me ev e; gelo yê ku li ser HTŞ'ê erê kiriye ne ew bûn? Gelo dewletên cîhanî yên netew dewlet ma nizanin ku Ebû Mihemed El Colanî heyanî niha di lîsteya terorê de ye? ma nizanin ku ji cografiya Efganistan û akedemiyên Ûseme Bin Ladên û Eymen Elzawahêrî derketine? Ya din ma ne wan erê kir ku Erdogan derbasî Efrînê bibe? Îorj wê çawa nerazîbûna xwe li hember van kiryaran nîşan bidin? Wê çawa hesab ji Erdogan û Colanî bixwazin? Sûriye ku weke mûzayîkekê bi pirrengiya xwe di nav xwe de jiyan dikir, niha dixwazin yek rengî derxînin holê ew jî rengê îslama sunî ye.

Dewlet netew û hêzên cîhanî nerastiya vê yekê dizanin lê dixwazin di nav netew û miletan de her tim pevçûn hebin. Da ku di nava van pevçûnan de winda bibin û biçin destê xwe li ber wan vekin; ka çareseriya we ji bo me çi ye? Yanî her tim gelan hewceyî xwe bikin. Ewqas talanî û sîyaseta cenosîd di Efrînê de bi serê gelê Kurd hatin kirin, ma çima deng ji wan derneket? Ji ber ku baş dizanin li hember hemû pirisgirêk, destwerdanên Tirkiyê û siyaseta dagirkirinê, li hember pevçûna ku di Sûriyê de tê jiyankirin; Projeyeke çareseriyê heye. Ew proje jî modêla Konfedralîzma Demokratîk ya Rêveberiya Xweser e, ku niha li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ketiye meriyetê. Ew jî dizanin ku ev proje dawî li sîstema kapîtalîst bîne.

Ji ber van sedemên durûdirêj bêdeng in, li hember hemû binpêkirin û sûcên dagirkeriyê lal in. Bi nêrîna min bêdengiya navnetewî li hember tavahî rewşa Sûriyê, ji ber ev pevçûn û kirîz ji akedemiyên wan hatine derçûn û ew vê teşeyê dîzayîn dikin. Her wiha dixwazin navbera Kurd û Ereban de gîtneyek ku bi sedan salan neqede, ava bikin. Ji bo şiyariya li hemberî lîstokên qirêj ên dagirkeriya Tirk, çi ji gelê Efrînê tê xwestin?

Em bi gelê me yê li Efrînê maye re dibêjin Ka ji xewa mirinê rabin bila cavên xwe li ser siyasetên ku têne meşandin vekin. Nekevin penca siyaset û komên ENKS'ê yên îtîlafê. Ev kes êdî dawî li wan hatiye û wê dîrok van bi bîr bîne çi dikirin û ji bo gelê Kurd çi bazar meşandin e. Divê gelê me bawer neke ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn û hikûmeta Colanî werin wan ji pencên komên çete xilas bikin, tersî wê hatina wan tê maneya rewakirina hebûna komên çete li Efrînê. Eger rast dixwestin komên çete ji Efrînê derxînin, bi gotinekê her tişt dihate guhertin. Ma ne Ebû Emşe nimûneya herî ber bi çav e. Wê çawa jê re bêjin şûrê xwe li ser stûyê gelê Kurd rake. Êdî nikarin bi sînaryoyekî wisa me bixapînin.

Ji ber vê yekê bila baweriya me bi hêz û siyaseta me hebe. Efrîn wê her ya Efrîniyan be û wê vegerekî bi rûmet û ewle para tevahî gelê Efrînê be.



## Bi mêjiyê baas-îxwanî Sûriya demokrat nabe!

**Mihemed Seydî**

Rewşa Sûriyê piştî reva serokê Rêjîma wê Beşar El-Esed xumamtir bû û hema bêje niha li welat mêjîyekî ku karibe jiyanê kontrol bike û bi rêve bibe nemaye. Her çiqasî hinek saziyên di bin navê meşandina kar de hebin û karekî beşî dikin jî, lê bi giştî di nava xelkê de nerihetiyek heye. Dema em behsa vê rewşê dikin, bi taybet işaretê bi herêmên di bin destê serweriya koma Ebu Mohammad El-Colanî dikin. Lê pêşeroj wê çawa be, hin wêneyên derdikevin holê, hinekî sedema tevliheriya zêde ya li pêşiya Sûriyan dide xuyakirin. Mirov dikare bibêje ku berê mêjiyê Baas ê şofînî welat kontrol kiribû milet xistibû nava tirs û xofê û zilm dikir, lê niha yên Îxwanî ku dijberî wan bûn ketin nav û hîn zêde mêjîyekî tarî, selefî û bi kîn li holê ye.

Em li vir qala vê yekê bikin ku herî dawî qaşo ji bo lidarxistina Kongreya Niştîmanî ya Sûrî komîteyek hat avakirin. Ev komîte bi rengê Îxwanî û bi mêjiyê Baas ê tarî li ber çavaye. Ev rastiya van jî di dema ragihandina avakirina Komîteyê de eşkere bû ku hat pirsîn ka ji bo Kurdan û Bakurê Sûriyê kî û çawa di nava kongreyê de wê cih bigre bû. Bersiva ku hat dayîn pêşî û dawiya meselê raxist ber çavan û yekser gotinên dewleta Tirk, rêjîma Baas û qaşo muxalîfeta wan a li Tirkiyê anî bîra me. Dibêjin QSD'ê nûnertiya hemû Kurdan an jî Bakurê Sûriyê nake. Lê avabûna vê komîteyê bi xwe dihêle mirov bipirse, gelo ev nûnertiya kê dikin? Nûnertiya Durziyan li Siwêdayê? Nûnertiya Elewiyan li Berava Sûriyê dikin? Nûnertiya Xiristiyanên li nava Şamê dikin? Belkî jî ew QSD'ê nûnerê Bakurê Sûriyê nabînin lê xwe wekî nûner dixwazin bidin diyarkirin?

Her wiha li ser ekranan dema em dibînin yekî Baasî yê berê ku bi selefî û Îxwaniyên niha re mêjiyê wî bûye koktêl û dibêje birayên me yên Kurd em û wan bê pirsgirêkên lê pirsgirêk QSD'ê an Rêberiya Xweser an jî YPG'ê ye, rastî mirov dibêje ev çi mêjiyên zengargirtî ne ku wê ji 10 salên derbas bûyî qet dersê dernexin. Bersiva zelal a nûnertiya gelên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku got herçî komîte yan jî kongre werin lidarxistin û ew tê de nebin, biryarên wê jî wan eleqedar nakin, ev komîte û yên li pişt wê ji niha de bê bandor kirin.

Li aliyê din, ger ev aliyên ku li Şamê niha serweriyê dikin, rastî jî di mêjiyê wan de hembêzkirina hemû aliyên Sûrî heye, çima ev zêdetirî 2 heyvan e li ser bakur û rojhilatê Sûriyê êrişên dewleta Tirk û gurûpên wê yên çete dewam dikin helwestek nîşan nedaye? Ger ew ji dewleta Tirk ditirse, wê demê wê çawa qale serweriya axa Sûriyê û yekbûna wê bike? Ger ew vî mêjiyê xwe yê Baas-Îxwanî ku niha bûye yek neguhertin, ew ê li Sûriyê çi demokrasî an jî aştî pêk were?

Îro rastî li ser erdê ye û QSD'ê hêza sereke ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye û nûnertiya wê ya Siyasî jî Meclisa Sûriyê Demokratîk MSD'ê ye û di warê rêveberiya Sivîl de jî Rêveberiya wê ya xweser heye û ger alî bi niyetin ku diyalog û çareserî dûrî destwerdanên dewleta Tirk pêk were, dikarin bi van aliyan re rûnên. Bakur û Rojhilatê Sûryê ne tenê Kurdin û hêza wan a siyasî û leşkerî nûnertiya tenê Kurdan nake, lê belê ya hemû pêkhateyan dike. Alî an kesên ku dibêjin ev alî nûnertiya Kurdan an jî Bakurê Sûriyê nakin, an kirêgirtî ne an jî tehemûl nakin ku Sûriya demokrat bibe û her pêkhate bibe xwedî mafê xwe yê siyasî, rêvebirin û çandî.



# QSD û gel neynûk û goştin ji hev nayên qutkirin

Berxwederên ku li Bendava Tişrînê bûn, Botan Hoşê û Mezher Şêxo dan diyarkirin ku berxwedaniya gelan li bendava Tişrînê mohra xwe li dîrokê xistiye û wiha gotin: "Bi berxwedaniya gelan dê bendava Tişrînê bibe bendava jiyanê"

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Berxwedana gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku bi însiyatîfa xwe di 8'ê Çileyê de berê xwe dan Bendava Tişrînê berdewam dike. Gelên ku ji 7 heta 70 salî beşdarî nobetê bûye, bi dirûşme û gerandina govendê hêzê didin berxwedana Tişrînê. Gel di dema gerandina govendê de alên QSD'ê hildigirin û dirûşmeya "Bijî Berxwedana QSD" berz dikin. Hemû pêkhateyan û endamên saziyên Rêveberiya Xweser jî tevlî berxwedana dîrokê dibin

Derbarê berxwedaniya gel li bendava Tişrînê welatiyên ku di berxwedana Tişrînê de cih digirin, ji rojnemaya me re axivîn.

**'Em dagirkeriya Tirk ku derê welat be bila bibe, napeijîrînin'**

Endama Dîwana Wêjeyî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û nivîskar Botan Hoşê da diyarkirin ku hatina wan ya li Bendava Tişrînê ne tenê ji bona piştgrî bidin şervanan, di heman demê de ji bona parastina zarokên xwe jî hatine û wiha nêrînên xwe vegotin: "Em îro şahîdiya berxwedaniyek bêhempa dikin. Em di heman demê de, parastina mafên zarokên xwe dikin. Ne tenê piştgiriya şervanan dikin, em li kelêka wan jî parastina pêşeroja zarokên xwe dikin. Bendava Tişrînê cihekê xizmetgûzarî û jiyanê ye, ne weke dewleta Tirk ya dagirker dibêje, ne cihê leşkerî ye. Ger ku Bendava Tişrînê bê dagirkirin,



Botan Hoşê

tê wê wateyê ku Rojava giştî hatiye dagirkirin. Deskeftiyên kurdan dê bi tevahî têk biçin. Kehrebeya herêmê û av hemû li wir tê hilbirîn. Siyaseta dewleta Tirk ya dagirker û komên çete yên girêdayi wê baş tê zanîn ku dema bendav çû dê gelê herêmê bêav bimîne. Armanca wan ew e ku gelê Kurd qir bikin. Bendava Tişrînê rih dide tevahî Sûriyê. Berxwedaniya li wir tê kirin berxwedaniya pêşeroja zarok û ciwanên bigiştî Rojavayê Kurdistanê ne. Em jî weke gelê Bakur Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin jî, dagirkeran li axa xwe naxwazin.."

**'Ev êrîşên hovane hemû bin navê Islamê tê kirin, lê Islam dagirkeriyê red dike'**

Rêveberê Kongira Islama Demokratîk Mezher Şêxo yê ku dinava berxwedaniya bendavê de cih digire got ku çete bi navê Islamê kiryarên howanê pêk tînin û wiha got: "Piştî hilweşandina rejîma Baas'ê li Sûriyê tevahî şer û pevçûn nemaye. Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên girêdayi wê hewildan



Mezher Şêxo

ji vê valatiyê sûd werbigirin. Ji bona dinav ava şêlû de avjenî bike, li ser wê bingehê çeteyên girêdayi xwe xistin nava liv û tevgerê de. Destpekê bajarê Minbicê hat armanckirin, piştre jî bendava Tişrînê û pira Qereqozaqê hate armanckirin. Bendava Tişrînê bûye bendava şehîdan û kêliyên hebûn û tinebûn ê tên jiyankirin. Armanca dewleta Tirk ya dagirker ya herî mezin ew e ku di axa tevahî Sûriyê de serwer be û bikare demografiya Sûriyê de guhertina bide avakirin. Ji xwe piştî têkçûyina rejîma Baas, bi serkêşiya Ehmed el Şeraa (Ebû Mihemed el Colanî) HTŞ'ê bi piştgriya dewleta Tirk ya dagirker hin bajarên Sûriyê dagirkirin û kiryarên wan jî ji xwe li holê ne. Ev kiryarane giştî jî, bin navê olî û taybet Islamî tên kirin. Di Islamî de qirkirin, kuştin dizî û talan nîne, yên ku Islama ku bingehîn dimeşînin gelê Kurd e. Ev nayê pejirandin ku gelê Kurd û yên herêmê binavê Islamê bi qirkirinê re rûbirû bihêlin. Weke ku êdî HTŞ'ê Sûriyê de hêza sereke ye êdî mayinde bûye dan xuyakirin. Bendava Tişrînê, bendava jiyanê ye û em rênadin ti kesî ku dest bawêje jiyana me. Em ê ked û xebata şehîdan kiriye wisa hêsan ji dagirkeran re nehêlin."

**'Divê cîhan bigiştî deng bidin qêrîna gelên Rojavayê Kurdistanê'**

Mezher bêdengiya saziyên navnetewî hemberî kiryarên dagirkeriya Tirk rexne kir û wiha axaftina xwe bidawî kir: "Cîhan hemû îro berxwedaniya gelan ya li bendava Tişrînê dimeşe, temaşe dik e. Di demê berxwedaniya Kobanê de, dewletên navnetewî û hêzên hegemon piştgrî didan komên çete yên binavê SMO (Artêşa Netewî a Sûriyê.). Piştî ku berxwedaniya şervan û gelan li Kobanê hat dîtîn serkeftin ava bû Kobanê bû sembolekî cîhanî. Ji ber wê ger em bi bendava Tişrînê jî serbikevin cîhan hemû li kêleka me cîh bigire. Em taybet ji bona dagirkeriya Tirk dibêjin; 'Kurd ne kurdê berê ne, tu nîkarî wî gelê bixapînî.' Ev gel şagirtên Rêber Apo ne û bi ramanên Rêber Apo hatine perwerde kirin. Em weke gel kêlî bi kêlî em QSD ne û QSD'ê emin. Em û QSD neynik û goştin, bihev ve nayên qûtkirin. Bila gelê me hemû wê rastiyê bawer bibe, serkeftin dê ya me be, em ê bi rihê şoreşgerane dagirkeriyê têk bibin. Weke mamosteyê mezin bavê Teyar anî li ser ziman me "Kefenê mirinê çirand." Hemberî tiliyan dayikan dê dêngê êrîşan qut bibe."

# 'Kar û xebata me ne bi qasî keda Rêber Apo ye'

**Amara Baran/Qamişlo**

**Li Rojavayê Kurdistanê bi hezaran kesên ku Rêberê gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan dîtine, hene. Bi taybet kesên ku serdana mala Rêber Apo kirine û di civînên wî de amade bûne, heta roja îro jî li ser wê bigehê têkoşînê dewam dikin.**

Li Rojavayê Kurdistanê bi dehan kes Rêber Apo dîtine û di civînên wî de hazir bûne, bi taybet dema ku Rêber Apo li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê bû. Yek ji wan jî Nahîf Elî ye ku di sala 1984'an de Rêber Apo dîtiyê û jê bandor bûye. Di derbarê mijarê de Nahîf Elî ji rojnameya me re axivî.

**'Naskirina Rêber Apo û tevgera azadiyê ji bo min tiştek nûbû'**

Nahîf Elî di destpêka axaftina xwe dde wiha got: "Berya ku Rêber Apo û tevgera azadiyê derkeve şoreşek bi navê şoreşa Barzanî hebû. Min di 18 saliya xwe de tevgera azadiyê bi rêka keç û xortên ku di zanîngehan de dixwendin û tevlî tevgera azadiyê bûbûn naskir. Di heman demê de sekin û tevgera



kadroyê PKK'ê bandorek li ser min kir û ez gelek dame fikrandin. Ji wê demê heta niha min soz da ku heta hinaseya xwe ya dawiyê ezê di vê rêyê de bimeşîm."

**'Rêber Apo di saniyekî de sê kar bi hevdûre dimeşand'**

Nahîf Elî behsa çûyina xwe ya cem Rêber Apo kir û wiha got: "Dema ku ez yekem car derbasê xaniyê Rêber Apo bûm not li pêşiya wî bû dixwand û bi destekî jî Radyo girtibû bi destê din jî pêşwaziya me dikir, ango li aliyekê not dixwand û li aliyekê radyo guhdar dikir, li aliyê din jî bi mêhvanan re mijûl dibû, Rêber Apo di saniyê de sê kar bi hevdûre dimeşand. " Rêber Apo di gotina xwe ya yekemîn de got ku " DIJMINEKÎ HOVE" piştî wê gotinê dest bi cîvînê kir û li gor pêvajoyê rewş nirxand. Komploya navnetewî ku li ser kesayeta Rêber Apo hat meşandin, tiştê ku dijmin xeyal dikir bi dîlgirtina Rêber Apo tevgera azadiyê tune bikin, lê tune nebû ji ber ku tevgera azadiyê koka xwe ji civaka xwe digre planê dijmin têk çû. şagirtên Rêber Apo xelekek ji agir li dora Rêber Apo çêkirin û gotin kes nikare roja me tarî bike. Êdî roj bi roj tevgera azadiyê mezin bû û ji çarçoveya partîbûnê derket û bû hereketek fîkrî û herkes tevlî bûye, ne tenê ji bona gelê Kurd, di roja îro de ji bona tevahî gelan kar û xebatê dike û bûye hêviya cîhanê tevahî.

**'Rêber Apo bi fikrê xwe îmralî kir dibistana jiyanê'**

Nahîf ragihand ku ew çiqas behsa keda Rêber Apo û tevgera Azadiyê bikin, ew ê li hemberî keda ku tê dayîn kêm bimînin û wiha domand: "Ruxmê ku îro êrîşeke hovane li ser me û tevgera azadiyê tê meşandin jî, hêviyên me xortin. 26 salin ku Rêber Apo li girava îmraliyê di nav 4 dîwaran de dîl tê girtin û işkenceyeke giran li ser tê meşandin. Tecrîda ku di nava 4 dîwaran li ser Rêber Apo tê meşandin, wî ew veguherand dibistana jiyanê ji hemû cîhanê re, em heta dawiyê bi hêvîne ku Rêber Apo wê cîhaneke azad ava bike. Tevî hemû zehmetî, êş şahadet û talaniyê hêviyên me naşikin û hêza tevgera azadiyê ji wan êş û azaran mezintire serkeftinên xurt jî wê pêk bîne. "

**Gelê kurd hertim birçiyê siyasetê ye**

Nahîf di dawiyê de wiha got: "îro bi saya fikrê Rêber Apo gelê kurd xwe naskir û bû xwedî hêz û vîneke xurt. Tevgera azadiyê di Rojhilata navîn de bû mînaka hêzê û coşa xwe ji civakê digre, civaka Kurd jî bi heman rengî nêz dibû. Di sala 2025'an de hêviyên civaka azadîxwaz bûye felsefa tevgera azadiyê û fikrê Rêber Apo, hemû cîhan îro li ser fikrê Rêber Apo jiyan dike û ji bona xwe wek hêvî dibîne. Proja ku îro li cîhanê tê meşandin proja Rêber Apo ye. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemû netewên ku di çeperên şer de şer dikin xwîna wan tevlî hev dibe û bi vê yekê re jî biratî û hevgirtina gelan bi hevre tê avakirin, ew jî encama keda Rêber Apo û şehîda ye."

FENER



## Hîna kilîta çareseriyê di destê Rêber Apo de ye

**Idrîs Henan**

Meha Sibatê, taybet 15 wê, rojek reş di dîroka têkoşîna gelê Kurd de ye. Heman dîrokê sala 1925`an, di şexsê Şêx Seîd û rêhevalên wî de komkujiyek mezin di derheqê gelê Kurd de rû da. Heman dîrokê sala 1999`an, Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan di encama komployeke navneteweyî de dîl tê girtin û radestî dewleta faşîst a Tirkiyê dikin. Diyar bû ku dixwestin di şexsê Rêber Apo de komkujî û qirkirina li dijî hebûna gelê Kurd dubare bikin. Ew roj bi zanebûn ji aliyê neyarên Kurdan ve hate hilbijartin ku di hafîzeya Kurdan de weke Roja Komkujiya Kurdan e. Lewre xwestin ji gelê Kurd re bibêjin; Ti şansê we yê azadiyê nîn e. Me xeyalên we, dîroka we ya siyasî û civakî, çarenûsa we ya neteweyî bi dîlgirtina Ocalan re destser kirin. Me roja we tarî kir!

Bi komployê re dixwestin hemû keda Rêber Apo û hewldanên wî yên pêşxistina çareseriya demokratîk têk bibin û têkiliyên gelan li herêmê bigihînin rêyeke girtî ku xwe bi xwe hevdu tune bikin. Lê têkîliyên gelan ku ti zemanî li gorî daxwaz û azweriyên desthilatdaran nehatibûn rêsandin, ne gengaz bû ku ewqas bi hêsanî biketana bin bandora lîskeke wisa ku dîroka hezarê salan ji nav biçe. Çendîn siyasetên dijminahiyê hatibin ferzkirin, lê dîroka biratiya gelan ji temenê wan siyasetan dirêjtir e ku rê nade xirabiyeke wisa pêk were. Ked û rola Rêbar Apo di vejandina dîroka biratiya gelan de diyarker e. Ji ber va têgihaştina rêbertiyê, berovajî bendewariyên komplogeran, Rêber Apo têkoşîn û berxwedana hezar salên derbasbûyî vejandin û lêgerîna xwe ya ji bo afirandina şert û mercên guncawtir domand. Mirov dikare bibêje ku kompoloya navneteweyî di demeke wisa de hat ku li dijî keda dîrokî ya Rêber Apo bû. Yek ji armancên wê jî; derbkirina biratiya gelan û bi komî kuştina gelê Kurd bû. Wan rola Rêbar Apo ya dîrokî di vê derbarê de baş dizanîn, lew re komplo jî li ser bingeha wê têgihaştina wan pêk hat. Ji ber wê jî hemû zagon û qanûnên navneteweyî bin pê kirin û bi rêbazên qursantî û rêbiran Rêber Apo revandin. Ji ber vê pêzanîna dîrokî ya rol û misyonên rêbertiyê yên edalet, wekhevî û biratiya gelan, têkoşîna azadkirina wî jî erk û misyoneke exlaqî ya hemû gelên azadîxwaz, demokrat û aşîtîxwaz e. Wezîfeya her kesî ye ku asta têkoşînê bilindtir bike ku ancax xebata efsanewî ya gelnasekî wisa dikarbe berxwedana azadî û demokrasiyê li ser lingan bihêle û bigihîne serkeftinê.

Eger îro pêşketinek di dewrê de be, serketinek neteweyî bi dest ketibe, Kurd siyaset, nirxandin û pêşengtiyê dikin, bi saya berxwedana dîrokî ya Rêber Apo ye. Aqilê ku şert û mercîn wê têkoşînê çêkiriye, rênîşandêriya Rêber Apo ye. Bi qasî ku berxwedana Rêber Apo rêya serkeftina têkoşîna gelan vekiriye, ewqas jî derfet daye neyarên gelan ku dest ji sîstema qirkirinê berdin û bi têkoşîna gelan re li hev bikin. Eger veguherînek cidî jiyan nekin û li ser zemîna lihevkirina bi gelan û qebûlkirina cudayiyan re tev negerin, misoger wê bi bayê rûdan û veguherînên li herêmê rû didin re biçin. Eger di îdîaya hegemoniyê de bi israr bin û dev ji polîtîkayên qirkirinê bernedin, wê nikaribin kêlîlyek be jî, rewşa heyî dewam bikin.

Îroj eger Rêber Apo pencereya aşîtiyê vekiribe, tê wateya ku, piştî 26 salan, hîna jî kilîta çareseriya demokratîk di destê wî de ye. Xweavêtina bextê wî jî, ji bilî wê yekê tiştek din îfade nake. Ancax jiyana hevbeş, demokrat û azad bi têkoşîna Rêber Apo û azadiya wî ya fîzîkî re pêkan be.